

Firotina endaman.. Rûdawa kirêt

Bijîjkê Newrozê

Nûrî, mirovekî di salên xwe yên sihî de ye, bavê çar zarokan e, li bajarê Efrînê rûdine û di saziyeke dewletê de karmend e.

Wek dibêje, ji ber ku rewşa wî ya aborî xirab e, dendar li deriyê wî didin, û "rizqekî" ku jê re were jî tune ye, wî serê xwe rakir çû bajarê Helebê, li hin nexaşxan gerî û dilxwaziya firotina gurçikeke xwe pêşneyar kir.

Bêguman kesên nexawş û dewlemend ku kanin gurçikan û belkî Nûrî bi xwe jî bikin hene, û her dem li benda kesên wilo ne... Ew kesên dewlemend bi hêsanî kanin 750 hezar L.S wekî ku gurçikek Nûrî hat bazarkirin bidin, û wî bi gurçikekê li zaroyên wî vegeştin, û hêrsa Fayîzciyên "bi wijdan û mafdar!!" jî dînin. Hîn di programa Nûrî de ye ku bi wan peran xaniyekî ji zarokên xwe re bikire. Bi rastî, dê çêtir ba eger di govdeyê Nûrî hemî mirovên xwedî "rizqê kê" de sê -çar gurçik û çar pênc kezêb... hebana; Lê dîsa mala Xwedê ava, wekî ku wî hin endamên govdeyê mirov çewî çêkirine, nexwe mirovên wek Nûrî, dê mîna bapîrkên xwe yên destpêkî li şikeftan û li çol û baniyan vegeştiyan;

Ji hêla din ve, erê bazara reş a firotina Endaman li Sûryê tê dîtin, lê bi rastî ew rûdaw li ba kesên Kurd û ji navça Efrînê tiştekî pir nûye û cihê lixwesarbûn û hêrsê ye. Rûdawa firotina endamên govdeyê mirovê sax ji bo bicihanîna pêdviyên jiyane, tiştekî pir kirêt û hîç ne mirovane ye, tu zagon û destûr, li hundir Sûryê û li derve jî rê nadin û wê qedexê dikin.

Lê mixabin mirov çiqas bibase û li dijî wê rûdawê bisekine, nikane rê li ber bibire û dê her gav hebe. Çinkî sedemên bingehîn jê re hene, divê em lê bigerin, nas bikin, û ji wan ve dest bi çareserkirina pirsê firotina endaman bikin.

Bi kurtî, em kanin sedemên bingehîn wiha bijmêrin:

1. Rewşa aborî ya xirab ku qada rênçber ji ber dinale. Di wê rewşê de hin kesên perîşan dê her dem ji bazara endaman re amade bin, li bervajî wê rastiye jî rastiyeke din heye, ew jî mirovê dewlemend ne tenê endamên govdeyê xwe nafroşe û nabaxişîne tu kesî, belkî ew wek baxşandin jî ji zaro û malbata xwe re qebûl neke.

2. Nezanî: Mirovê nezan amade ye ku endamên govdeyê xwe bifroşe. Kesên wilo her gav nêçîra bêhêvîtiyê ne, ew bawer nakin ku her mirovek kane gelek karan bike, û rewşa xwe ya jiyandinê jî berepêş û baştir bike.

3. Zagonek ji bo baxşandina endaman li Sûryê nîne, ji bilî ku baxşandina endaman bi xwe jî li ba xelkê Rojhilata Navîn nebûye çand û baweriyeke resen. Ji bo çespanîna wê çandê, rola rêberên olan û alavên ragihandinê gelek giring e. Ji bilî ku zagonek jî ji bo durustkirina baxşandina endamanên kesên ku li ber mirinê ne zor pêwîst û pir gerek e. Çinkî di sersiya wê zagonê de, her kesek kane weseka xwe bike û li ber mirinê endamên xwe bêpere yan jî bi peran bide panga parastina endaman. Wê hîngê, dê netê bîra tu "Nûrî-yan", endamên govde xwe bifroşin û xwe têxin bin buvehî û metirsiyên giran.

